Bidestveanîna Mafên Netewî Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal De

Hejmar: 197
5'ê Çileya Paşîn a 2013'an
Buha: 150 Tûmen

# Agirî

**Peyama pîrozabahiyê a rêzdar Mistefa Hicrî derheq sersala nû a Zaînî**

**Bi boneya sersala nû a Zayînî û jiDayîkbûna Hezretê Îsa Mesîh, pîrozbahiyekî germ li peyrewên Ola Mesîh li hemû Cîhanê, bi taybet li peyrewên vê Olê li Îran û Kurdistana Îranê de dikim, jiber ku Mesîhiyên Îranê seba cudahiyên Olî, pitir ji azadîxwazên din yên Îranê, ji aliyê rejîma Îranê ve li jêr zext û givaşan de dijîn. Hêvîdarim ku sala nû, sala rizgariya peyrewên ola Mesîh û hemî olên din û netewên Îranê be. Bi hêviya rojên pir ji xweşî û şadî bo hemî aliyan**

**PDKÎ, Sekreterê giştî   Mistefa Hicrî**
**31'ê Çiriya Pêşîn a 2012'an**

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û giştî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Iranê diweşîne      www.kurdistanmedia.com/kurdî

**Birjiniskî:**


## Amerîka wê êrîşa leşkerî bike ser Îranê



**Şêvirmendê Cîmî Kartêr serkomarê berê yê Amerîkayê di warê ewlehiya netewî de ragehand ku, Îran mijara sereke ye di gotûbêjên komisyona karûbarên derve ya kongireya Amerîkayê ye de.**

Zîbginyo Birjîniskî herweha ragehand ku, herçend heya niha Obama xwe ji bikaranîna vebijêrka leşkerî li dijî Îranê parastiye, lê heya niha derheq programa navikî a rejîma Îranê, negehiştin tu encamekê. Lewra ew yek rêxweşker e bo destêwerdana leşkerî li dijî bernameyên nûkleriyên Îranê, û di encam de Amerîka, bi tenê yan jî bi hevkariya Îsraîlê, wê vebijêrka êrîşa leşkerî bo ser binkeyên navikî ên rejîma Îranê hilbijêre.

## Obama paketa tehrîmên nû li dijî rejîma Îranê wajo kir



**Barak Obama serkomarê Amerîkayê, bi vajokirina pêşnivîsa bergiriyê ya 633 milyard dolarî ya sala 2013'an ya Amerîkayê, tehrîmên tundtr li dijî Komara Îslamî a Îranê pajirandin.**

Serokkomarê

Amerîkayê bi vajokirina pêşnivîsa han, nîgeraniya xwe li hember peywendiyên beşên înêrjî, gemîvan, gemîsazî ên Komara Îslamî a Îranê, digel çalakiyên peywendîdar bi geşandina programa nûklerî ya vî welatî, eşkere kir û ew tehrîmên nû pejirandin, û li ser vê yekê pêdagirî kir ku hekî kesek yan jî şirketek filizên bi nirx bişîne Îranê, wê ji aliyê Amerîkayê ve bê cezakirin.

Li gor paketa nû a tehrîman şandina filizên bi nirx weke "Girafît, Alominyom, Istîl, rejûyê Mitalojî û Nermefzarê Pîşesazî"yê, bo Îranê qedexe ye.

## Ehmed Turk serdana Îmraliyê kir



Hevserokê Kongireya Civaka Demokratîk Ehmed Turk û parlemanterê BDP`ê Ayala Akat hevdîtin bi serokê PKK`ê Ebdulla Ocelan re pêk anîn. li gorî zanyariyan eva demeke serokê Îstîxbarata Tirkiyê (MIT) ji bo çekdanîna PKK hevdîtinan li gel Ocelan pêk tîne. Piştî vê hevdîtina Ehmed Turk li gel rêzdar Ebdulla Ocelan , vê nûçeyê dengvedaneke zaf li ragehandinên Turkiye, herêm û cîhanê de hebû.

Serokê herêma Kurdistanê jî bi derkirina daxûyaniyekê kêfxweşiya xwe ji vê hevdîtinê nîşan da û hêvî xwast ku her du alî bona destpêkirina gotûbêjan li pêxema çareseriyê de pêngavan hilgirin.

Piştî vê ku li ser biryara Îmraliyê gireva birçînbê bidawî hat, hem Turkiye û hem jî bîrûraya giştî hatne ser vê bawerê ku Ocelan aliyeke vê pirsê ye û bêy wî nikarin bigîjin tu çareseriyan.

R:4
Roboskî! Tawanek li dijî mirovahiyê




R:6
Biryara "Congress" a Amerîkayê



R:7
Îran û Turkiye, têkiliyên pirr...



R:8
serjimêriya kuştina kasibkarên Kurd...




R:11
Bingehê nasnameya Kurdan zimanê wan e



Hejmar 197, 5'ê Çileya Paşîn a 2013

# Wajokirina du belgenameyên mirovî û giştgîr

## sedem, hewcehî, û rê û cih

Hevpeyvîn: Riza Fethullanijad

**"Gellek caran bîrûrayên nedemokratîk û pirr ji cudahî heta li mêjiyê wî kesî de jî heye ku xwe kesekî demokrat dihesibîne, jiber ku hukim nine ku ew yek bi zanebûn be".**



Mîro Elyar, bajarê Jinêv, di dema wajokirina belgenameyên Jinêvakalê

Ew yek gotina Dr. Mîro Elyar endamê Deftera Siyasî a PDKÎ, di rewta gotûbêjekê de ye ku derheq wajokirina dubelgenameyên navneteweyî, li ser parastina mafê jin û zarokan ji aliyê vê partiyê ve di gel wî me birêve bir. PDKÎ tevî çar rêkxirawên siyasî ên din ên Kurdistana Îranê li 14'ê Desambera 2012'an li Jinêva Swîsê du belgenameyên ser bi rêkxirawa Jinêvakal, (bangewaza jinêv) wajo kir ku pêk tên ji " belgenameya pabendbûna bi bangewaza Jinêv bo qedexekirina tundûtîjiya sîksî, li rewşa aloz ya şerê çekdarî de û berev jinav birina cudahîdanîna regezî" û "belgenameya pabendbûna bi bangewaza Jinêv bo parastina zarokan ji bandora nakokiyên çekdarî". PDKÎ bi wajo kirina wan belgenameyan, li pêwendî tevî bendên pêdagirîkiriî li ser wan erkdar dibe. Dr. Mîro Elyar ku bi nûnertiya PDKÎ li civîna pêwendîdar bi vê wajokirinê de beşdarî kiriye, li ser vê bawerê ye ku garentiya herî giring bona cîbicîkirna bendên vê belgenameyê "hîndekarî, hîndekarî û hîndekarî" ye. Guherîna bîrokeyên nademokratîk û cudahîdanan bi dijî jin ûp zarokan karekî giştgîr û hemûalî dixwaze, bi awayekê ku li welatên pêşkevtî ên cîhanê de hêzeke zaf ya mirovî, rêkxiraweyî û hikumetî di pêxema wan armancên bilind de tên danîn, çi bigîje bi vê ku di civakeke wek Kurdistana Îranê kar jêre bê kirin, ku deshilateke nedemokratîk û serberedayî wek Komara Îslamî bi ser de zal e. Deshilatek ku li gorî aysaya wê ya bingehîn geşepêder û piştîvanîkerê danîna ferq û cudahiyan bi taybetî bi dijî jinan e.

Rojnameya Kurdistan bona zêdetir hûrbûna li ser wan du belgenameyên mirovî û nasyarbûna di gel boçûna PDKÎ derheq hewcehiya wajokirina wan, û karkirin û şêweya cîbicî kirina wan ew rapora jêrîn berhev kiriye.

- rêkxirawa Jênavakal û kiryarên wê

Her du belgename her wek ji navên wan ve diyar e, belgenameyên pabendbûna bi bangewaz û gaziya Jinêvê ne. Bamgewaza Jinêv rêkxiraweke navneteweyî ye ku li sala 2000'ê de hate damezrandin û her wek Dr. Mîro dibêje "Zêdetir bi vê hatiye nasîn ku dijî bikaranîna mînên dijî takekes e". PDKÎ li 4'ê Desambera 2007'an de bi amadebûna birêz Mistefa Hicrî sekreterê PDKÎ, lihevhatina "qedexebûna mînên dijî takekes" li nawenda vê rêkxirawê li Swîsê wajo kir, û bi awayek fermî bû endamê vê rêkxirawê. PDKÎ ji vê demê pêve heya niha li komeke çalakiyên Jinêvakal de beşdraî kiriye û heta bi çavdêriya vê rêkxirawê, hijmarek mînên paşekevt kirî li enbarên PDKÎ de li kar xist. Renge ew pirsyara bê pêş ku gelo dewlet jî dikarin bibne endamê Jinêvakal û lihevhatina qedexebûna mînên dijî nefer, û belgenameyên ser bi vê rêkxirawê wajo bike. Di vî warî de me ji Dr. Mîro pirsyar kir ku di bersivê de got: " Jinêvakal taybetmendiyeke giring ya wê ew e ku diyalog û alîkarî, di gel aliyên çekdar ên xeyrî dewletî dike. Tevî vê yekê jî di gel NGO û rêkxirawên warê dakokî ji mafê mirov, mafê jinan, mafê zarokan û ... alîkariya berdewam heye". Jinêvakal tevî konvansiyona Jinêv û rêkxirawa NY, alîkarî û pêwendiyeke rasterast heye.

### Bijartiyek ji belgenameyan

Belgenameyên pêwendîdar bi mafê zarokan bi vî awayî dest pê dike:

"em ( navê vê aliyê ku îmze dike) ji riya nûnerên xwe ve ku sedhilatek tewaw pê ahtiye dan, nîgeran in derheq bandorên bi zirar û berfireh ên nakokiyên çekdarî, ku li ser geşekirina cesteyî û eqlî a zarokan heye, û vê derencxama xirap ku wê piştre li ser tenahiya mirov û cihgirbûna aştî û geşekirinê, wê hebe.

Em pêdagiriyê li ser xwastekên xwe dikinderbarê parastina xelkê sivîl bi taybetî zarokan ji bandor yan tehlûkeya karê leşkerî, herweha bona rêzgirtina ji mafên wan bo jiayanê, bo perwerde û geşekirin ku li awayê herî baş a xwe de li berjewendiya zarokan de be".

Ew belge name bi giştî berçavgirtina çend pirensîpên navnetewî û giştgîr li pêwendî tevî parastina mafê zarokan li dema şer de bi xwe ve digre, ku çend xalên wê weha ne:

Berçavgirtina " sitandardên curbicur ên nav yasayên navnatewî, ku parastineke taybet bo wan zarokan dabîn dike, ku nakokiyên çekdarî bandor li ser wan hebûye".

" em haydar in ji vê ku yasaya bingehîn a dadgeha navnetewî ya tawanbaran, vê yekê wek tawan dihesibîne ku zarokan jêr 15 salî, bo leşkeriya bi zorî bêne birin".

"zaroka bi vî awayî têne pênase kirin ku divêt temenê wan jêr 18 saliyê be".

"Em girêdayî dibin bi qedexekirina tewaw ya bikaranîna zarokan di dema dujminkariyan de".

"Emê karê rastîn digirne pêş bona xatircembûna ji vê ku zarok tewaw destê wan bi xurek û agehdariyên tendurust ( ku ew yek alîkariya derûniya civakî jî bi xwe ve digre) û perwerdê jî bi xwe ve digre, û li her ciheкê ku îmkan hebe , destê wan divêt bigîje çalakiyên demderbazkirin û çalakiyên kulturî".

"Em asankariyan dikin bo hewlên rêkxirawên mirovî ên bê alî, derheq vegerandina zarokan bo nav malbatên wa".

"biryar û rênimayiyên hewce em derdikin, bo dezgehên siyasî û leşkerî, û her weha bo fermander û mîlîtanên xwe, bi armanca karpêkirina ya ku me girtiye stûyê xwe. Ew yek jî karê bilavkirina zanyarî û hîndekariyê bi xwe ve digre".

Dom R: 3

## Sergotar

## Îran û Turkiye

Şehab Xalidî

Her du welatên Îran û Turkiye ku li heştê salên borî de evraz û nişîvek zaf di têkiliyên siyasî ên navbera wan de hebûye, û li ser pirsên siyasî ên herêm û cîhanê hinek caran hevhelwest û carna jî helwestên cuda hebûne, piştî hatine ser karê a dewleta AKP'ê li Turkiyê de rûpeleke nû di têkiliyên siyasî û tîcarî ên navbera her du welatan de hate vekirin.

Rejîma Îranê bi sedema vê ku têkiliyên wê bi welatên Ewrûpayî re, li ser pirsa navikî gellek lawaz bibû, hewcehî bi pêwendiyeke baştir di gel Turkiyê hebû. Lewra xwe nêzî Turkiyê kir û Turkiye bû bi bazareke germ ji bo şandinaneft û gaza Îranê, û Îran jî bû bzarek germ bo kalayên Turkiyê. Ji aliyek din ve hemû demekê hem Turkiye û hem jî ÎranK li ser nifûza zêdetir û bihêzkirina deshilata xwe û bilavkirina modêl û şêweya deshilatdariya xwe li herêmê de, rikeberî hebûye, lê Turkiye berdewam di warê enirjiyê ve hewcedarê Îranê ye û Îran zêdetir ji %10 ji enirjiya Turkiyê dabîn dike.

Ew pêwendiya pirr ji evraz û nişîv a di navbera her du welatan depiştî gihîştina pêla Buhara Erebî bo welatê Sûriyê, berev sarbûnê ve çû.

Ji aliyek din ve razîbûna Turkiyê bi danîna sekoya mûşekiya patiryût di nav xaka Kurdistanê hêndey din rejîma Îranê nîgeran kiriye.

Lewra bi sedema wan bîrûboçûnên cuda ên siyasî û îdeolojîk ku rejîma Îranê û weha dixuye ku ew têkiliya pirr ji evraz û nişîv ya di navbera Îran û Turkiyê ber bi sarbûneke zêdetir ve here, û asayîbûna wan pêwendiyan jî girêdayî ye bi bûyerên piştî nemana Beşar Esed û hatine ser karê ye hikumetek nû di vî welatî de, ku bêguman wê demê gellek ji hewkêşeyên siyasî ên herêmê guhertin bi ser de tê.

Doma R: 2

Belgenameya pêwendîdar bi mafê jinan weha dest pê dike:

" em (navê vê layenê ku îmze kiriye) ji riya nûnerên tewaw girêdayî bi xwe ve, nîgeranîn derheq wan bandorên dirêjheyam ên cesteyî û derûnî û civakî ku tundûtîjiya sîksî heye li ser qurbaniyan û malbatên wan û civatgehan bi taybetî li rewşa aloz ya çekdarî de, û herweha ew tehlûkeya ku dixe ser tenahiya mirovî û aştîparêzî.

" em pêdagiriyê dikin li ser biryarên xwe bona vê ku hemwelatiyên sivîl û kesên din ku beşdar ninin li dujminkariyan de, ji tehlûkeya oporasyonên leşkerî biparêzin û rêz ji mafên wan ên bingeîn bigrin".

Em belgename bi giştî berçav girtina çend pirensîpên mirovî û giştgîr derheq rûbirûna tevî bandorên malkavilker ên rewşa şer li ser jinan bi xwe ve digre ku çend xalên wê weha ne:

" emê bi tewahî vê yekê berçav bigrin ku yasayên navnetewî tewaya curên tundûtîjiyên sîksî qedexe dike, û ji vê yekê jî agehdar in ku karê tundûtîjiyên sîksî, wek tawana şer, û tawan bi dijî mirovahiyê û wek komkujî (jînosayd) tê hesibandin".

" em biryarê didin ku me rol hebe bona dawîanîna bi xwederbazbûn ji cezakirina tundûtîjkaran di warê sîksî".

" em vê yekê berçav digrin ku ew siyaset û karên ku cudahiyan didanên li ser bingehyên cureyên komelayetî, bi taybet ya ku bi dijî jin û keçan tê encam dan, dibne sedema cureyên din ên tundûtîjiyan".

"Em bi tewahî pabend dibin bi qedexe kirina tundûtîjiya Sîksî" dijî her kesekê, çû hemwelatiyê sivîl be, yan ser bi hêzên çekdar ên dewletê yan ser bi çekdarên ne hikumetî be".

" emê hewlek zêde bidin bona dabîn kirna vê alîkarî û pişgiriya ku qurbaniyên tundûtîjiya sîksî, hewcehî pê hene bo derbazbûna ji bandora wan cure tundûtîjiyan".

"Em hewlek zêde didin bo desteberkirina beşdariyek zêdetir û mijûlbûnan jinan li piroseya biryardanê li gişt asteke de".

"em biryar û rêniwîniyên hewce derdikin, bo dezgehên siyasî û leşkerên xwe, û herweka bo fermande û milîtanên xwe, bi armanca karpêkirina ya ku me girtiye sitûytê xwe, ku ew yek jî karê bilavkirina zanyarî û hîndekariyê bi xwe ve digre".

**Çavdêriya bi ser çavaniya birêvebirina bendên belgenameyan**

Li vir de ew pirsyar tê gorê ku rêkxirawa Jinêvakal çawan, bi ser rewta cîbicîkirina bendên her du beklgenameyan de çavdêriyê dike:

Dr. Mîro Elyar li vê derheqê de bi rojnameya Kurdistan ragehand ku : " li ser daxwaza Jinêvakal ku her rêkxirawek ku ew belgename îmze kiriye, divêt du kes bi Jinêvakalê bide naskirin bona vê ku çavdêriyê bi ser rewta cîbicî kirina wan de bike. Ew du kes erkdar in du salan carekê rapora çavdêrî û karê xwe bidin, Jınêvakalê".

Ji Dr. Mîro me pirs kir ku gelo Jinêvakal her bi rapora wan kesên ku ew rêkxiraw bi wan dide nasîn razî dibe, got: " em bi vê hindê razî nabin, belkû her demekê Jinêvakal bixwaze heqê serdana li binkeyên ser bi vê rêkxirawê heye û dikare tevî endamên wê li her asteke de gotûbêjê bike û her demekê daxwza pêkanîna simînar û civîn û ...hwd bike, divêt em bersiva erênî bidin wan".

**Hewcehiya îmzakirina belgenameyan ji aliyê PDKÎ ve**

Renge ew pirs li cem hinek kesan pêk bê ku gelo PDKÎ heya niha bi wan pirensîpên mirov û giştgîr ên ku li wan belgenameyan de pêdagirî li ser hatiye kirin, pabend nabûye ku niha belgenameyek weha îmze dike, birêz Elyar li vê derheqê de got: " na, ew yek nayê vê wateyê ku me peyrewî ji wan belgenameyan nekiriye. Em wek PDKÎ wek tevgerek mirovî ji her pêngavek ku li ser pirensîpên cihê baweriya me ku pirensîpên mirovî pêdagirî bike, û bona zêdetir geşandina wan bîrokeyan be, pêşwazî dikin, û li vê derheqê de bo hizra pêşkewtîa xwe hevpeymanan peyda dikin". Navbirî mînakekê li vê derheqê de radixe ber çavan: "Niha welatek demokratîk ku aliyê kêm li astê navneteweyî de bi modern û pêşkevtî hatibe nasîn, wek Swîsê ku bilavoka navneteweyî a mafê mirovan îmze dike, gelo ew yek tê vê wateya ku wan heyta niha bendên vê bilavokê binpê kirine, ne, belkû bona qahîmtirkirina wan bîroke û pirensîpan ku hertim berçav girtine, îmze dike".

**Perwerde, perwerde perwerde**

Her wek ji naweroka her du belgenameyan re diyar e, PDKÎ tevî wajokirna wan erkdar dibe bi cîbicîkirina bendên wê û pêngavhilgirtina bi kiryar li pêxedm armancên diyarî kirî li nav wan de. Elyar jêve ye hewceye ku divêt karê hizrî û ronîkirinê li nav tewaya tex û qatên Kurdistanê de bihê kirin. Ew li ser vê bawerê ye ku: "Em (PDKÎ) tevî vê ku li gorî programê û bi bawer partiyek modern in, lê bi sedema çavaniaya xebata xwe û rewşa xebatê ku ser mr de hatiye sepandin, hêla me nekariyê buhayên mirovî bi vî awayî ku hewce ye li civaka xwede propagendeyê jêre bikin".

Navbirî rû li endamên PDKÎ dibêje: " gellek giring e ku endam û rêkxistina me zanyariyan li ser hewcehiya berçavgirtina wan belgenameyan hebe, û bizanin ku ew jî li gorî erkên xwe, bi birêvebirina rasdipardeyên Jinêvakalê pabend bin".

Birêz Elyar li ser vê bawerriyê ye ku her takeke civakê hest bi vê yekê bike ku hewce ye di wan waran de perwerdê bibîne û zanyariyan bi roj bike, îca ew kes demokrat be yan ne. Bi raya wî " gellek caran hizrên nedemokratîk û pirr ji cudahî heta di nav mêjiyê wî kesî de jî heye ku xwe demokrat dihesibîne, ji ber ku ne hum e ku ew yek bi zanebûn be".

Wî mînakek da me ku li çend salên borî de biryarek bo endamên YE derket ku li piraniya pîşeyan de ew kesên ku daxwzkarê damezrandinê ne, hewce ye ku belgeya tewawkirina dewreyeê hebin ku bi navê dewreya " dîtin û berçavgirtina cudahiyan" û hewce ye ku her du salan vê belgeyê nû bikin. Bi boçûna Dr. Mîro ew yek mînakek berçav e ku li Ewropa ku pitir ji du sed salî dibe demokrasî tecrube kirine û xelkê wan her di dema zarokatiyê ve li warê reftarên demokratîk hatine perwerde kirin, hest bi hescehiya hînbûn û bi roj kirina zanyariyan di warê parastina mafl jin û zarokan dike, jiber ku em ku li vî warî de ku xwediyê wan îmkanat û pêşîneya wan jî ninin, nabê hest bi giringiya perwerdê nekin. Ew dibêje ku PDKÎ heta amadeyiya xwe li cem Jinêvakalê eşkere kiriye ku waneya fêrkariyê li vê derheqê de jî bo endamên rêberiya PDKÎ bêne danîn û pêdagire ku riya herî baş, **"Perwerde, Perwerde, û Perwerde"** ye.

## nexşeya siyasî a Rojavayê Kurdistanê hat diyar kirin



Navenda Yasayê nexşeyek nû ji Rojavayê Kurdistanê belav kir. Di vê nexşeya nû de kurdistana rojava, ji gundê Eyîn Dîwarê ve dest pê dike û heya Bendera Eskenderûnê diçe.

Di nexşeya Nawenda Yasayê de hemû deverên Rojavayê Kurdistanê di yek parçeyî de hatine kişandin, lê rûberê herêma Kurdistanê li Sûriyê de nehatiye diyarî kirin. Weke tê xûyakirin rûberê Kurdistana Sûriyê ji rûberê welatê Lubnanê berîntir e.

Li gorî amarên nefermî hijmara Kurdan di Sûriyê de pitir ji sê milyon kesî dibe.

Şêvirmendekî Mursî:

## Îsraîl heya 10 salên din wê ji nav her

**Osam Eloriyan Şêvirmendê Mihemed Mursî serkomarê Misrê regehand ku di 10 salên dahatî de Îsraîl jinav diçe.**

Navbirî ku yek ji serkirdeyên Îxwanol Moslimîn e, di doma gotinên xwe de ragehand ku di 10 salên dahatî de Filistîn rizgar dibe û Îsraîl jî ji nav diçe û dibe dagîrker jî vegerin welatên xwe.

Herweha daxwaz ji cihûyên bi regez



Misrî kir ku axa Îsraîlê bi cih bihêlin û vegerin Misrê, da ku riya vegeriyana Felestîniyan bo ser xaka xwe xweştir bibe.

www.arsivakurdi.org

# Roboskî! Xwîn digrî, gelo kî berpirsyar e?





Selîm Zencîrî

Gava mirov rûpelên dîroka Kurdistanê vedide, kêm rûpel dixuyin ku bi bûyerên tal, cinayet, komkujî û tirajîdiyan ve ji aliyê hêzên zal bi ser Kurdistanê ve nehatibine nexşandin û xemlandin. Dîrokek ku pir e ji êş û azaran û hêj jî didomin. Bi taybetî li parçeyê nav xerîteya siyasî a Turkiyê de, dewletê bona serketina di siyaseta helandin û jînosayda kurdan de hovêtî û tirajîdiyên mezin pêk anîne.

Komkujiya Roboskiyê jî yek ji wan e ku di 28'ê Kanûna 2011'an li Qilebana Şirnexê de pêk hat û têde 34 xortên kurd ku 19 ji wan zarok bûn, bi êrîşa balafirên şer ên Turkiyê jiyana xwe ji dest dan.Cinayeta han doma cinayetên din ên weke Dersîm, Zîlan, Agirî, Sîwas, Meraş, Sason û şevitandina 4000 gundên kurdistanê, operasiyonên leşkirî, girtin, îşkence û ...hwd e. Her çend dewletê ji riya tirsandin û çavsoriyan ve kariye yên berê binuxumîne û balgiyê xatircemiyê bixe bin serê xwe, lê ew bûne beşek jibîrnekirî a dîroka kurdan û rojek wê bê ku hesaba her hemûyan li baregeha edaletê de ji wan bê xwastin û şermezarê dîrok û mirovahiyê bên kirin.

Her çend ku li komkujiya Roboskiyê de jî dewlet û hikûmetê hewil dan ku bi çewaşekirin û berxwar kirin raya giştî cinayeta Roboskiyê jî veşêrin û bispêrine rûpelên dîrokê, lê bi ser neketin. Ji ber ku ne kurd, ne jî serdem ya berê ye. Em dibînin ku piştî borîna salek bi ser bûyerê de dosyeya Roboskî her zîndî ye û gel bi berxwedan, hevkarî û hevxebatî û bi ruhê netewatiyê xwedî ji îrade û zarokên xwe derketin û yekîtiya xwe bihêz kirin û bi çalakiyên cur bi cur ên şermezar kirinê, hikûmeta Turkk birin jêr pirsiyarê. Lewma nirxandin û encamên ku mirov dikare piştî salekê ji Roboskiyê bigre ev in:

- Mentalîte û zîhniyeta hakim cudahiyek wusa berçav bi yên berê re nine û pir caran çareseriyê li tund û tûjî û taktîkên gor perwerdeya xwe dibînin.
- Jiyan û canê xortên gelê kurd ne ji wan re girîng e, ji ber ku li ser kuştina 9 hevwelatiyên turk li keştiya Marmaray;, amade bûn ku pêwendiyên xwe bi welatekî herî bihêz ê deverê weke Îsraîlê qut bikin û lêborînê weke pêşmerc bona çalak kirina pêwendiyên xwe xuya bikin.
- Siyasetên qirêj ên dewletê bi nîsbet kurdan û nedana derfetên karî ji wan re jiyana gundiyên kurd dijwar kiriye û hejari û zehmetiyên jiyanê wan neçar dike ku bona bijîva malbatên xwe riyên herî metirsîdar bi nirxa ji dest dana jiyana xwe bigrin ber xwe.
- Serbarê wê ku di bin givaşên raya giştî de, hikûmet neçar ma ku komîsyonek taybet ji Meclîsê bona lêkolîna jêre pêk bîne, lê xwe gêzirandin, lênepirsînek micid û ronî nekirina sedem û encamên wê, nîşan dide ku hikûmet xwe nade bin barê berpirsatiyê û dixwaze bi leyîstokên weke bikujên nediyar û dewleta kûr vî barê giran li ser xwe hilde û bêdengiyê jê bike. Bi vê siyasetê jî zêdetir kurdan û malbatên goriyan birîndar û dilşevitî dike, ku eva jî xizmetê bi bihevre jiyana aştiyane a wan nake û şeqara navbera kurd û dewletê berfireh û kûrtir dike.
- Hikûmet çewaşekariyan bi nisbet kurdan dike û dixwaze wusa nîşan bide ku hin ji wan ne sivîl in û rewatiyê bide cinayeta xwe, lewma jî lêborînê naxwaze û bi gotinên derevîn kurdan û raya giştî dixapîne daku hêdî hêdî ji bîra wan bibe û bispêre erşîvê.

**Encam:**

Di yekemîn salvegera vê tirajîdiya bijan de kuradan bi xemgînî, lê bi gireseyî û bi ruhê hevkarî, biratî û yekîtiyê ve ew bibîr anîn. Eva ku 850 saziyên sivîl bi pêşengiya partiyên siyasî dest dan çalakiyên bîranîna goriyan û şermezar kirinê bi metodên curbi cur, nîşan ji bihêzbûna hesta netewî, ruhê berxwedan û xawedî derketina ji xortên gel e û mal û gewherên dunyayê bal wan nake dîtina yek care wan. Lewma tenê bi berxwedan û zîndî hiştina dosyayê, hawar birin bo saziyên mafên mirov û dadgehên navnetewî, hikûmet û dewleta turk neçar bikin ku lêpirsînek micid bide destpê kirin û bi pêkanîna dadgehiyek dadperwerane encaamderên eşkere û lêborînê ji gel bixwazin. Bi vî awayî him rê liber dubare nekirina tirajîdiyên han tê girtin û him jî rê xweş dibe bona diyalog û çareser kirina pirsê bi metodên aştiyane û bihevre jiyana wekhev ku li qazanc û berjewendiya hemû Turkiyê de ye. Ji ber ku azadiya kurdan mafê kesê pêpes nake, belkî sînorê demokrasî, azadî, bextewerî û bihevre jiyanê li turkiyê firehtir dike. Lewma hikûmet jî dibe cesaret bike û bi îradeyek qahîm gavên hewce bavêje ku ew jî carê lawaz e.

# Rojhilata Navîn ji "kê hikimkirinê" ve ber bi "çawa hikimkirinê" ve!



Sarya Azer

Pêşdîtina senaryoyan li ser rewşa civakî-siyasî ya Rojhilata Navîn her ku diçe dijwar û dijwartir dibe. Buhara Erebî li gel xwe kêşeyên ku birînên kûr û girêyên li hevaliyayî yên navçeyê bûn, ji nû ve kelijandin û li gel xwe ber bi dawiyeke bê pêşdîtinê ve dibe.

Buhara Erebi ji birînên kêmaniyên netewî, mesebî û her wuha kontakta sekolarîsm û hikûmetên îslamî, demokrasîxwezî û dîktatoriyê çê bûye.

Ev navçe bi dehan sal in ku ji aliyê dîktatoriyên tek ol, û tek netewe ve hatine birêvebirin. Ji aliyeke din ve, şerê Îsraîl û Filestînê, bi dehan sal e, herêm tûşî şer û pevçûnan kiriye.

Buhara Erebî di rastiya xwe de kontakta demokrasîxwezî û dîktatoriyê ye, û herwuha hêviyeke mezin e ji bo destpêkirina proseya demokratîzasiyonê û xwedî nasnamebûna gelan bi her awayeke olî, netewî û regezî.

Di nirxandinke gîştî de, rewşa navçeyê û serhildana gelan di bin navê buhara Erebî, vê rastiyê derdixîne holê ku îdî serdemê modernîzasiyonê, di wê navçeyê dest pêkiriye. Karl Poper felsefeya siyasî ya civakên ne modern, bi vê pirsyarê dide nasandin ku wê "kî hikim bike". Lê ew dide zanîn ku pirsyara felsefasiya siyasî ya serdemên modern, ev e ku wê "çawa hikim bê kirin".

Rojhilata Navîn bi qonaxa modernbûnê ve, nêzîk e. Her çiqas ku hin faktorên girîng weke dewletên îslamî yên tundrew, li hember wê diyalektîkê de berxwedanê dikin, lê guhartin, di rê de ye, û dema pêşiya me, wê bibe qada rikeberiya modernîzasiyon û yasayên çaxên navînî yên desthilatdariyên heyî di navçeyê de.

Ji aliyeke din ve, hin hêzên ku li berxwe didin û xwe ji guhartinê re amade nakin, rewşa navçeyê pilan û bernameyên daristî yên hêzên rojavayî ji bo destêwerdana di karûbarên navxweyî didin zanîn. Li gor nêrîna wan, aloziyên navçeyê ji projeya "Rojhilata Navîn a Mezin" ku di sala 2003'an de, ji aliyê Amerîkayê ve hatibû ragehandin, çavkanî digre. Lê di rastiyê de, ew naxwazin vîn û



îradeya gelan û daxwezên wan yên demokratîk berçav bigrin.

Her wek di mînakên serhildana gelên navçeyê de xûya ye ku daxwza mafên wekheviya hemwelatiyan bû ku dîktatorî ji desthilatê vêde birin.

Hemwelatî ji endamên civakên siyasî yên ku di coxrafiyayeke diyar de dijîn re,tê gotin...

Dom R:10

www.arshivakurd.org

Agirî



Hejmar 197, 5'ê Çileya Paşîn a 2013

# Esed diçe û Kurd hêşta jî bi hisabên biçûk ve mijûl in




Memo Şahîn

Dezgeha îstixbarata Almanyayê dezgehek kûr û bi quwet e. Bê deng, bê teşqele karê xwe dimeşîne. Destê wê hem li cem desthilatdaran in, hem jî li cem mûxalifan. Çi li hûndir, çi li derva pêk tê, serwext e.

Di dema êrîşa Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê li hember Seddam, di rojên krîtîk yên di buhara 2003'an de agahiyên giring, kordînatên baregehên Seddam, îstîxbarata Almanyayê pêşkeşî Amerîkiyan kir û wisa jî Bexda ket û destpêka rûxandina rejima Seddam ket qonaxek nû de.

Destên îstîxbarata Almanyayê ne tenê li Îraqê xurt bûn, destê wê her wiha li Sûriye û Îranê jî heya qesr û parlamentên wan welatan jî dirêj dibû û dibe. Navê vê siyasetê jî mîna "Diyaloga Kritîk" dabûn.

Wan rojan îstîxbarata Almanyayê (BND) zengil lêda û îlan kir ku emr û jiyana rejima Esed ne dirêje û ber bi dawiyê ve diçe. Diyarde û nîşaneyên vê yekê jî ji çend hefteyên dawî de derket pêşberî raya giştî. Hewldanek navnetewî li Ewropa, Rojhilata Navîn, li Rûsya û Amerika rû da û nêrînên cûda nezikî hevûdu dibin.

Ger Rusya ji aliyê Amarika û Ewropa bê tatmînkirin, daxwaz û berjewendiyên Rusya li Sûriyeyê û hewza Derya Spî bên berbiçavgirtin, mesele temam e û pêvajo jî ber bi dawiyê wê biçe. Rûsya niyeta xwe eşkere kir û niha bazarî li ser daxwazên Rûsya tên meşandin. Di heman dem û wextê de jî muxelefeta Sûriyeyê ji nû ve hat şidandin û Koalisyona Netewî ya Sûriyê li Qeterê hat demazrandin. Her wiha li Antalyayê serkêşên Artêşa Azad a Sûriyê hatin ba hev û di bin sponsoriya, sîwana Tirkiye, Fransa, Îngîlîstan, Amerîka, Qeter û Erabistana Siûdî de navendek leşkerî damezrandin.

Muxalifên Ereb refên xwe qayimtir dikin û cûdahiyên xwe datînin aliyekî û xwe ji bo desthilatê amade dikin. Li ser dahatû û pêşeroja Kurd û Kurdistanê qet tiştek pozitîf nabêjin, ne dezentralizasyona Sûriyeyê qebûl dikin û ne jî bo statûyek nû bo rojavayê Kurdistanê hazir û amade ne. Bi ser de jî helwesta Kurdan hêşta ne yek e; hêzên Kurd ne yekdeng in, ne hemaheng in, ji hevûdu re ne vekirî ne.

Raya Kurd bi ragihandina Desteya Bilind a Kurd di navbera hemû hêzên siyasî ên rojavayê Kurdistanê de gelek dilşad û bextewar bû. Ev yekitî li hemû Kurdistanê bû sedema şahî û dilxweşiyê. Lê çend meh derbas nebûn, kes nizane, ma ev yekitî maye an na. ji ber ku her alî li têl û miqamek cûda dixe; yek govendê ber bi aliyê rast ve dikşîne, yê din hewl dide ku govend ber bi aliyê çep ve here.

Biryarên hevbeş ên Desteya Bilind a Kurd li erdê man, ne di aliyê siyasî û leşkerî de, ne li aliyê dîplomasî û têkiliyên derva de gavek bi hevra hatin avêtin. Ev hemû li pêşberî raya giştî ya Kurdistan û cîhanê pêk tên. Lê dîsa jî dema ev hêz li Hewlêrê tên ba hev, behsa hemahengiyê dikin,û wêneyên bi rûken belavdikin.

Raya Kurd jî dizane ku mesele, problem, pirsgirêk di navbera hêzên mezin û sereke de ye. Raya Kurd li parçên din li ser konsepteke hevbeş li hev nakin. Ser de jî di şerê mezhebî ku niha li Sûriyeyê pêk tê, ji hev cuda difikirin. Yek piştgiriyek şermok dide cepheya Suniyan, alîgirên xwe bê dawet dişîne Stanbol û Doheyê, yek bi awayek sergirtî mil dide eniya Şîiyan. Aliyekî cepheyê Tirkiyeyê dikşîne, serkeşiya aliyê din jî Îran dike û hevşîrikên wê jî Sûriye û Iraq in. Ev hemû jî rejîmên dîktator in; Kurdistan di bin nîrê wan de dinale.

Tirkiye li alîkî, Îran, Îraq û Sûriyê jî li aliyê din şerek mezhebî dijî hev dimeşînin. Nakokiyên mezhebî hezar sal in berdewam in. Lê dema pirsa Kurd hat holê, ev dubendî, neyartî û dijminatî di nav wan hêzan de namîne û hemû bi hevra li hemberê Kurdan disekinin û dibin yek.

Seddam çû, lê Sçeddamek nû di nav civata Ereban de bejn davêje. Malikî haziriya sefera Kurdistanê û şerê Kurdan dike. Sibê jî wê Esedek nû di nava wan hêzên nû li Sûriyeyê de wê bejn bavêje û rewşa Kurdan ji îro xirabtir be.

Kes nabêje ku ev hêzên sereke li Kurdistanê di hemû pirsgirêkan de, di hemû beşên siyasî de wek hev bifikirin. Lê qet nebe di hinek mijarên bingehîn de frekansên xwe bikin yek û bi hevre bişewirin, bidin bistînin.

Pirsên ku bersiv tên xwestin ev in: Encûmena Nîştimanî ya Kurd li Sûrî, an jî çend hêzên vê yekîtiyê dikarin rojavayê Kurdistanê birê ve bibin, gelê Kurd li hemberî êrîşên neyaran biparêzin û dahatûya Kurdistanek bi statûyek nû, çi otonomî, çi federasyon bidestxînin? Civîn û hewldanên li Stanbol û Antalyayê, li Qahîre û Qeterê jî nîşan dan ku ji bo wan guhertinan Tirkiye û muxelefeta Sûriyê ne amade ne û naxwazin jî.

Tirkiye dixwaze dubendî di navbera hêzên Kurd de derxe û wext qezenc bike, da ku hêzên Îslamî bi serkevin. Paşê çi dibe, em hemû jî dizanin.

Yekitî bi lihevkirinan, pêk tê û pêvajoyeke diyalogê, dayîn û standinê ye. Dem tê, digire; dem tê, dide. Lê di dawiyê de hemû bi hevra bi qezenc derdikevin û digêhêjin armancên xwe.

Dem nema û wext jî nêzîk bû. Îro nebe, sibê; ev meh nebe, çend mehên din Rûsya jî destên xwe ji pişta rejima Beis bikşîne û Esed ji Şamê wê derkeve. Bona ku sibê em li pêşberî zarokên xwe şermzar nebin, pêwîste em niha de destên xwe bidin hev.

Rojhilata Navîn serûbin dibe; sînor, xet û hidûd ji nû ve tên qişandin; sîstemên dîktatoran sist dibin û ji hêzê dikevin, lê dîsa jî em Kurd nikarin ji wan gûhertinên bingehîn de mifahê werbigrin. Em hêla bi hisabên biçûk mijûl in.

Qedera rojavayê Kurdistanê ne li Enqerê, û ne jî li Tehran û Bexdayê wê bê nivîsandin, lê li Qamîşlo û di destê aktorên Kurd de ye. Sozên ku Bexda, Tehran û Enqerê dayine Kurdan û aqûbet û encamên wan eşkere û diyar in. Tehemûla Kurdan ji şaşiyek nû re nemaye û wext jî dereng e!




www.arsivakurd.org

Agirî 6

Hejmar 197, 5'ê Çileya Paşîn a 2013

# Biryara "Congress" a Amerîkayê



Ebdulla Hicab

Piştî Yêkitiya Ewrûpa, roja 28ê Sermawezê Kongreya Amerîka (Congress) jî biryar da ku dezgehên propagendeya Komara Îslamî, ku bi Saziya Deng û Rengê Komara Îslamî tê nas kirin bixe lîsteya xwe ya reş û dorpêçan dane ser. Di heman biryarê de navê serokê saziyê Îzetullah Zarxamî jî weke tawanbar di mijara binpê kirina mafê mirovan de tê anîn ku li gor biryarê, ev jî dikeve ber pêla nû ya dorpêçên Amerîka bo ser Îranê.

Pêştir ji ber biryara Yêkitiya Ewrûpa şirketa Hotbird, niha jî li ber biryara nû ya Congressa Amerîka, şirketên Sêlên Esmaniye Intelsat u Eutelsat xizmetguzariyên ji bo hêlên weşana Televîziyonên Îranê birîn. Ev pêgav tê wateya hindê ku weşana televîzyonên Îranê ne li gor pîvanên ragehandinê ye ku ji aliyê saziyên navneteweyî ve, bi lihevhatin û li gor hin standardên cîhanî hatine danîn.

Di gel ku di piratîkê de ev biryar nekaribe bi awayek şkêner bandorê danê ser siyaseta propagendeya Komara Îslamî an dezgehên ragehandina rêjîmê bi tengasiyên cidî re rûbirû bike, lê mana ya sembolîk ya wê biryarê pir giringe. Niha êdî navendên giringe biryardan di asta navneteweyî de jî gîhane wê qinaetê ku dezgeha propagendaya rêjîmê rola sereke di pêkanîna arîşeyan, berevajî kirina rastiyan û belav kirina tovê dijminkarî, netifaqî, û tundutîjiyê de heye.

Bi taybet hegerên derxistina biryara nû ku ji aliyê Congressê ve hatin ragehandin, xwedî giringiyek taybete. Ji ber ku navenda biryardana DYA bi biryarek fermî wê rastiyê radigihîne ku destê karbidestên dezgehên propagenda (Radio û TV) ya Komara Îslamî di binpê kirina mafê mirovan de zêde heye. Ji karbidestan bi der, siyaseta propagendaya Komara Îslamî jî bi awayek raste rast di xizmeta wê zêhniyetê de ye ku mafê mirovan bi awayek bêrehmane binpê dike.

Serokê dezgeha Propagendeya Komara Îslamî Izetullah Zarxamî, ji wan xwendekarên tundajo yên girêdayî Rêbaza Xumeynî bû ku piştî şoreşa sala 1979 (1357) Balyozxaneya Amerîka dagîr kiribûn. Pişt re wî di hêzên Sipahê Pasdaran û paşan jî hêzên ewlekarî u polîs de siyaseta tundajoyane ya rêjîmê pêş ve biribû u ji sala 2004 ve bûye serokê Dezgeha Deng u Rengê Komara Îslamî u bi kiryar wê rolê di komara Îslamî de dilîze ku Paul Joseph Goebbels (1897-1945) li Alman a bin deselata Adolf Hitler de dilîst.

Goebbles di şerê cîhanî yê duyemîn de wezîrê Propagenda Hitler bû û heya dema ku bi jina xwe Magda re 6 zarokên xwe kuştin u pişt re xwe întihar kirin, siyaseta şerxwazî u arîşexuliqandina Almana Nazî pêş ve dibir. Siyaseta wî ya propagendayê ew bû ku hizra şer u reşkirina neyarên Hitler bibe nava hemû qadên civakê u bi riya propagendaya tuj ya ku bandor li ser hestên mirovan datîna hemû civaka Alman ji bo şer u zêdexwaziyê amade bike.

Her çend Zerxamî bi xwe danerê siyaseta Ragehandina Komara Îslamî nîne, lê weke yek ji karbidestên herî tundajo yên girêdayî bi Elî Xameneyî u rêbaza tundajoye Xumeynî re, ev li ser siyaseta şerxwaziya Komara Îslamî xwedî bandorek mezine. Lewma biryarek pir di cî de bû ku di gel dezgehên propagendeye rêjîmê berpirsyarê serve yê wê dezgehê jî bikeve nava lîsteya reş de.

Di wan 34 salên jiyana Komara Îslamî de dezgeha Deng û Rengê Komara Îslamî li ser sê pîvanan kar kiriye ku her 3 ji wan li dijî hemû pîvan û prensîpên mafê mirovan, demokrasî û azadiya ramanê bûne. Pîvana yekê ya xebata wê dezgehê weşandin û belav kirina îdeolojiya tundreve Xumeynî ye ku cîhanê bi reng û bi şêweyek cuda ji pîvanên demokrasiyê dibîne û şirove dike. Ew îdeolojî demokrasiya lîberal, azadiya tak û mafê biryardanê weke pîvanên betal û bê nirx nîşan dide û li hember wan nirxan, girêdana bi Xumeynî, pêrewkirina bê munaqişe ji rêberê Olî û bê bawerî bi şiyana tak di biryardanê de pêş ve dibe. Stûna duyemîn ya siyaseta propagende ya dezgeha Deng û Rengê Komara Îslamî, belav kirina kultûra şer û şerxwaziyê di nava civakê de ye. Bi awayekê ku felsefeya kuştin û xwedanekuştin, ku ew jê re dibêjin kultûra «şehadetxwazî» weke nirxa herî bilind di civakê de bê rûniştandin.

Sêyemîn stûna propagendeya Komara Îslamî çandina tovê nejadperistî, binajoyî û dijberiyê ye. Di encama wê siyasetê de mijara dijberî bi her kes, sîstem û aliyên ku cuda bifikire an şêweyek cuda ya jiyan û siyasetê hebe bûye beşek ji kultûra îroye Komara Îslamî.

Her sê pîvanên ku hatin baskirin û gelek aliyên dine siyaseta propagendeya Komara Îslamî, îro bûne serekaniya tundajoyî û binpê kirina mafên mirovan. Ev nêrîn bi awayekê hatiye belav kirin ku heta hin tevger û hêzên tundajoye din, yên ku renge bi hin awayan li hember Komara Îslamî bin jî, her heman rêbazê dişopînin.

Tevgera Kurdistanê u derdorên domkrat li Îranê bi dehan salin ku li hember wî warê siyaseta ragehandina Komara Îslamî şiyariyê didin, lê mixabin heya wê dawiyê guhên guhdêr tune bûn. Niha ku navendên xwedî bandor li siyaseta cîhanê wê rastiyê dibînin û bi hin biryarên wêrek dixwazin riya pêşve çûna wê şêweya propagenda û siyasetê bigirn, pêwîste ev pêgav tenê di wê çarçoveyê de neyên sînûrdar kirin.

Qut kirina weşana televîziyonên Îranê li ser hin hêlên satelitê, biryarek di cî de ye, lê mixabin têrê nake û nikare pêşiya rola neyêniye propagendeya Komara Îslamî di civaka Îranê de bigre. Ji xwe muxatebê propagendeya Îranê tenê bi riya satelitê ve hizra pir ji jehriye Komara Îslamî wernagirin.


Ewan kanalên cuda hene. Ji wê bi der, Îran dikare bi riyên din û bi alîkariya fîrmayên din dubare weşana xwe ya bi riya satelîtê berdewam bike. Lewma pêwîste ev pêgava di cî de ya Congresê, tenê di çarçoveya hatî ragehandin de nemîne. Ji ber ku cîhana ewle û bi asayiş wê tenê demekê pêk were ku rê ji belavbûna îdeolojiyên weke îdeolojiya dijmiroviye Komara Îslamî re bê girtin.



www.arsivakurdi.org

## Rejîma Îranê dîsan hate mehkûmkirin





Arif Velzî

Roja 20'ê çiley pêşîn a sala 2012'an ya Zaînî, di civîna salane ya kora giştî ya NY li niyoyorkê, cardin rêjîma Îranê bi sedema binpêkirina berfireh ya mafê mirov di Îranê de bi piraniya dengan hat mehkûm kirin, bi vî awayî civaka cîhanî nîgeraniya xwe li hember rewşa nebaş ya mafê mirov di Îranê de ducarî kir.

Bi dirêjahiya hatineserkara Komara Îslamî heya niha, bi awayek berdewam û bi şêwazek hovane û sîstimatîk mafê mirov di vî welatî de hatiye binpê kirin û, eva jî bûye sedem vê ku ev rêjîme di nav kor û komelên navnetewî de, weke welateke serkûtkerê mafê mirov bihê nasandin. Lewra em dibînin ku ji aliyê civaka cîhanî ve biryarnameyên weha li ser wê hatine pejirandin û li ser asta navxwe û navçê û heta cîhanê jî riswa û îzoletir bibe.

Berçav negirtina peymannameyên navnetewî û binpê kirina yasa û rêsayên cîhanî ên peywendîdar bi mafê mirov ji aliyekê ve û, ji aliyê din ve pêrewkirina siyaseta tepeserkirinê li dijî gelên Îranê bi merema fetisandinana dengê azadîxwaz û cudahizran ji aliyê deshelata reha ya Wilayeta Feqîh ve, bûye sedema vê ku hakimiyet vegere nav bazneya sedsalên navîn de, û bi şêwazek radîkal hukimraniya çend kesên kevneperest bi ser 70 milyon kesî ji xelkê Îranê de bihêt sepandin.

Siyaseta binpêkirina carnameyên cihanî a mafê mirov di Îranê de û heta pêrew nekirina yasayên darêtî ji aliyê wan bixwe ve, rewşwk weha afirandiye ku têde bi tenê îşkence, bidarvekirin, li berçav negirtina mafên jin û zarokan, jinavbirina fîzîkî a neyar û cudabiran, û zexta li ser kêmaniyên mezhebî di welat de, rê nedan bi her cure çalakiyek siyasî û civakî di çarcoveya girûp û sendîkayan de, nebûna azadiya raderbirînê, nebûna helbijartinên azad, kêşana cîxizê li ser çapemeniyan û bi giştî ragehandinê, bi merema sansorê, xirabiya rewşa derman û pizişkî, giranî, birsîtî û ... Hwd, bo gelên Îranê bi dû xwe re aniye û xelk di gel nexweşî û jiyanek dijwar berbirû kiriye.

Pejirandina biryarek weha ji aliyê civata giştî a NY, ve rastiyê diselimîne ku, êdî civaka cîhanî nikare binpêkirina mafê mirov di Îranê de qebûl bike û Komara Îslamî jî weke welatek îzole û dûr ji civaka cîhanî, hekî vê siyaseta xwe ya qirêj bidomîne, hem ji aliyê NY û kor û komelên navnetewî ve digel ceza û biryarên weha û bigre tundtir jî vê berbirû be, û hem jî ji aliyek din ve, digel dijkiryara bihêz a xelkê Kurdistana Îranê li derve û navxwe, ku avakerê hêza siyasî û însanî ya berfireh ya gelên Îranê ne, wê berbirû be.

## Hogo Çawêz sonda yasayî ya serkomariyê naxwe



**Dewleta Vênzoêlayê ragehand ku, Hogo Çavêz dikare bêy ku sonda serkomariyê bixwe, sêyemîn gera serkomariya xwe dest pêbike.**

Hogo Çawêz ku heymek berî niha bo cara sêyemîn weke serkomarê Vênzoêlayê hat hilbijartin, tûşî nesaxiya penceşêrê ye û niha li welatê Kûbayê di bin çavedêriya pizişkî de ye.

Nîkolas Madoro cihgirê serkomarê vî welatî ragehand ku, li gor yasaya bingehîn ya Vênzoêlayê, dadgeha bilind dikare merasima sondxwarina Hogo Çawêz di rojek din de birêve bibe.

Di hember de jî dijberên hikumeta Çawêz dibêjin ku, hekî Çawêz li Welatê Kûbayê bimîne, dibe deshelat bi serokê parlemêntê bihê dan û di heyamê sî rojan de, hilbijartinek nû bihê encam den.

## Rojev

## Bi sekinîna jiyana siyasî a Mam Celal Îraq berbirûyê kirîzan dibe

N: Pîter w Galîbres

Di vê qonaxê de pêşbîniya dahatûyeke dûr bo rêzdar Celal Talebanî serkomarê Îraqa Federal ku tûşî kirîza mêjî hat hinekî ne zelal e. Bo heyamê 25 salî ew hevalê min bû, ew ji min re cihê rêz û hurmetê bû û ez hêvîdarim ku zanayiya wî û zîrekiya wî ku di hindûrê wî de ye, wî rizgar bike û ji nesaxiyê rizgar be. Tevî vê ku wî xebatek berdewam kir bo yekem car li hilbijartinek demokratîk de wek serkomar hate hilbijartin, di dîroka dûr û dirêj a cihekê ku wek landika şar5istaniyetê lê tê nêrîn. Niha zû ye bo pêşbînî kirinê ku em bizanin ka wê çi bibe, lê ew yek eşkere ye ku renge wî ew hêza caran tuneb, û mixabin ji dest diçe.

Rêzdar Talebanî ku tewaya jiyana xwe goriyê armancên xwe bo rizgariya neteweyî û Kurdistanê kir, bi berdewamî wek kesekî aştîxwaz û kesayetiyekî rêkxer tê pênase kirin û di rastî de renge li nav serkirdeyên siyasî ên Îraqa federal de tenê kesek e ku kariye yekîtî û tebahiyê di nav wan de pêk bîne. Bi tenzeke siyasî tê gotin ku Talebanî her neteweyî bî rdike û tevî vê ku serkomarê Îraqê ye, dema ku diaxive û dibêje "welatê min" armanca wî Kurdistan ene Îraq. Gelek mandînenasane li gorî destûra bingehîn a Îraqa federal bergirî ji mafêt Kurdan kiriye.

Di rastê de Kurdan bi vê sedemê ji Talebanî hez dikir, jiber ku li nav hemû serkirdeyên Îraqî de kesayetiyekî diyar û xwedî şiyan bû. Hewil dida ku kêşeyên siyasî ên li navbera PDK û YNK wek di partiyên sereke di qadê de, riya diyalog di gel rêzdra Mesûd Barzanî bi hevre çareser dike. Niha xelkê Kurdistanê renge wek hewce nirxa serkomariya birêz Mam Celal hest pê nekin, lê piştî vê ku Talebanî serkomar nemîne, wê demê dê bizanin ku ew çiqas giring bûye.

Kurd dixwazin Bexda mafên siyasî ên herêma Kurdistanê derheq petrolê biparêze, û rê bide ku referandom bo vegferandina Kerkûkê û herêmên veqetiyayî ku li gor destûrê hatine danîn birêve herin û Kerkûk û herêmên veqetiyayî vegerînin ser îdareya herêma Kurdistanê.

Hikumeta herêma Kurdistanê ku hilbijartiyê xelkê xwe ye, hêzek bi navê pêşmergê Kurdistanê heye ku li hemberî Malikî û hikumeta Federal de gellek bihêz e, aboriya Kurdistanê geşe kiriye û hikumeta herêma Kurdistan her carê zêdetir pêwendiyên xwe bi cîhana derve re, bi taybetî li gel cînarê xwe Turkiye bihêz dike. (bi nirxandina pêwendiya di navbera Malikî sero0kwezîrên Îraqê di gel Erdoxan serokwezîrê Turkiyê ku pêwendiya wan jehrî ye), Bexdayê tu bandoreke wê li herêmê de nine. Li gorî destûra bingehîn a Îraqê parlementoya Kurdistanê dikare wan yasayên ku li hikumeta federal de bo Kurdistanê têne danîn, li gorî rewşa Kurdistanê biguhere yan ret bike. Lê bi kiryara hikumeta federal tu deshilatek bi ser herêma Kurdistanê de nine, her wek ew jî kêmtir destêwerdanê di nav karûbarê nawendê de dikin. Heya niha jî nebûna rêzdar Talebanî li nav xelkê Ereb û bi giştî herêmên Erebakincî ji Kurdistanê zêdetir hest pê tê kirin. Jiber ku li şerê navxwe ê di Îraqê de birêz mam Celal û rêzdar Mesûd Barzanî sitareke êmin li Kurdistanê bo mesîhiyan û Erebên Sûnne pêk anîn ku ji tirsê tundûtîjiyên tayifî û mesebî direvîn. Heta berî vê li sala 2005'an de bibe serkomar, Talibanî di gel şêxên Îraqê nasyar bû. Beşek ji ên ku hatibûn neçar kirin ku birevin û bêne Kurdistanê, li Dukanê li rex bendavê, ku cihê bêhnvedana Celal Talebanî bû, yektir dîtin, ku bi tewahî vê denê hest bi vê hindê dihate kirin ku Sunne bi tenê mane.

Rêzdar Mam Celal bo heyamê zêdetir ji şêst salî li herêma herî hestyar a coxrafiyaya siyasî a cîhanê de, bo demokrasî, azadî, dadperweriya civakî û dijî dadperwerî xebat kir, aştîxwaz û navbeynkarekî xwe şiyan e.

W: Moitesem Nûranî
Çavkanî: www.Forigpolicy.com

www.arsivakurd.org


# serjimêriya kuştina kasibkarên Kurd, li ser sînorên Kurdistanê

"**Nawenda lêkolîna civakî a Rojhilat**" bi piştqahîmiya bi nawenda amaran a "**Ajansa Nûçegihaniya Kurdpa**", lêkolînek amarî, derheq kuştina kolber û hemwelatiyên ku bi destê hêzên leşkerî ên rejîma Îranê hatine kuştin, xistiye rû.
Serjimêriya tomarkirî li nawenda amarî ya Ajansa nûçegihaniya Kurdpa, bi piştqahîmiya bi çavkaniya bawerpêkirî û nasnameya qurbaniyan hatiye tomarkirin û ew amar tenê di warê hijmar û rêjeyî ve têne bilavkirin.
Hêjayî basê ye ku di vê raporê de cudakirina navê "hemwelatiyên medenî" ji "kolberan", tenê bi armanca cudakirina wan hemwelatiyan e ku bê sedem ji aliyê hêzên leşkerî ên hikumeta Îslamiya Îranê ve li ser riyan hatine kuştin.

**Hijmara kuştî û birîndaran 1**


| Kuştî û birîndar | Hijmara hemwelatiyan | rêje |
|---|---|---|
| Kuştî | 67 | %62.6 |
| birîndar | 40 | %37.4 |
| tewahî | 107 | %100 |

**Xişteya jimare 2**




**Hêma (nimûdar)**

Ew nimûdar nîşan dide ku mehên Cozerdan û Rezber, her yek ji wan bi 19 qurbaniyan ve, zortirîn rêjeya kuştiyan li xwe girtiye û mehên "Banemer", " Pûşper û Xezelwer", û " Gelawêj û Xermanan" bi 11, 12, û 10 kuştiyan ve li pileya duyemîn de cih digrin. Herweha mehên Sermawez bi 9 kes û Xakelêwe jî bi 6 kuştiyan ve, kêmtirîn, amara qurbaniyan têde ye.




**Xişteya 3**

Cihê bûyeran diyarî dike

| Cihê bûyerê | Hijmara hemwelatiyan | rêjeyî |
|---|---|---|
| Herêmên sînorî | 43 | %40.2 |
| çiyastan | 8 | %7.5 |
| Cade û riyan | 27 | %25.1 |
| Nadiyar | 29 | %27.1 |
| Bi giştî | 107 | %100.0 |

**Xişteya 4**

| Regez | Himara hemwelatiyan | rêjeyî |
|---|---|---|
| mêr | 105 | %98.1 |
| jin | 2 | %1.9 |
| Bi giştî | 107 | 100,0 |

**Xişteya 5**

| Temenê qurbaniyan | Hijmara qurbaniyan | rêje |
|---|---|---|
| Jêr 18 salî | 2 | %1.9 |
| 19 ta 24 | 16 | %15.0 |
| 25 ta 30 | 2 | %1.9 |
| 30 ta 34 | 7 | %6.5 |
| Ji 35'ê sertir | 7 | %6.5 |
| nediyar | 73 | %68.2 |
| Bi giştî | 107 | %100.0 |

**Xişteya 6**

| Şêweya mirina qurbaniyan | kuştî | birîndar | Bi giştî |
|---|---|---|---|
| Teqeya rasterast a hêzên leşkerî ji kolberan | 38 | 24 | 62 |
| Teqîna mîn (kolber) | 1 | 2 | 3 |
| Sirêbirina kolber | 2 | 0 | 2 |
| Topbaran (kolber) | 2 | 4 | 6 |
| Bordûmana balafirên şerker ên Turkiyê (kolber) | 2 | 1 | 3 |
| Ketina mav kanalên sînorî de (kolber) | 1 | 0 | 1 |
| Hokar û sedema nediyar a mirina kolberan | 1 | 0 | 1 |
| Teqeya rasterast a hêzên leşkerî li ser riyan | 19 | 9 | 28 |
| Teqeya li hemwelatiyên medenî li herêmên kurdakincî | 1 | 0 | 1 |
| Bi giştî | 67 | 40 | 107 |

Li gorî xişteya hijmar 6 teqeya rasterat a hêzên leşkerî yekemîn sedema kuştina kolberan e, ku li gor vê 38 kes hatine kuştin û 24 kes jî birîndar bûne.

Herweha serjimêriya kuştina hemwelatiyên medenî 19 kes ji birîndaran zêdetir e, di demekê de ku ew kesane li ser riyan li herêmên Kurdistanê bi gumana hilgirtina kelûpelên qaçax teqe li wan hatiye kirin û bûne qurbanî.

www.arsivakurdi.org

Mamosta Hemdî:

# Piştî çend rojan birsîtî û mandîbûnê, dema me rastî û dirustiya axavtina Dr. Qasimlo dît, êş û elem û mandîtî di leşê me de nema

Hevpeyvîn: Arif Vêlzî



Hemdî Husênî kurê Mihemed Elî naskirî bi mamosta Hemdî, sala 1342'an li gundê gowaz a Jawero ya Merîwanê hatiye dinê. Navbirî her di destpêka zarokatiya xwe de li gundê Gowazê dest diaveje xwendinê û qonaxa despêkî li Sipaha Daniş a wî çaxî de bi dawî tîne. Paşan bo dirêjîdan bi xwendina xwe diçe bajarê Sinê.

Mamosta Hemdiyê pêşmerge derheq nasyariya xwe bi PDKÎ re weha dibêje; “Di nava bajarê Sinê de partî û rêxistinên siyasî pir bûn, di 11'ê reşemeya sala 1357'an de, PDKÎ dest bi xebata xwe ya eşkere kir, heyetek payebilind ya PDKÎ bi serperestiya Dr. Qasimlo seredana bajarê Sinê kir. Di mîtîngekê de ku li qada Fîzawaya bajarê Sinê de birêve çû, Dr. Qasimlo basek li ser siyaset û boçûnên PDKÎ kir. Eva bû despêkek bo vê yekê ku ez PDKÎ nas bikim û herim program û peyrewa navxwe a PDKÎ bixwînim. Piştre bo min derket ku siyasetên PDKÎ rûn û zelal in û yekemîn partî ye ku bi dilsozî û bi kiryar di pêxema bidestveanîna armancên bilind û pîrozên gelê Kurd de xebatê dike”.

Navbirî li dor tevlîbûna xwe bi PDKÎ re weha ji Agiriyê re axivî; “Di despêka sala 1358'an de; dema ku min li bajarê Sinê ders dixwand, ez çûm komîte şaristana Sinê û mn ji wan re got ku ez dixwazim xebatê bikim û hevdem dersa xwe jî bixwînim. Berpirsên komîtê bi min re gotin ku, tu wegere nava bajar de û hewdem digel xwendina xwe, weke endameke rêxistinî a nehênî di nava bajar de bixebite. Min jî pêşniyara komîtê qebûl kir û tevî hevalên xwe ên hizbî, me rexistinek pitir ji 40 kesî li sinê ava kir. Bi vî awayî karê xwe yê rêxistinî di hundûr de me domand heya Buhara sala 1362'an, ku teşkîlata me li bajarê Sinê eşkere bû û seba vê ku me hevdu nas dikir, ez neçar mam ku bajarê Sinê bi cih bihêlim û tevlî refên kadr û pêşmergên PDKÎ bibim”.

**roja şehîdkirina kak Mensûr Fetahî ku gellek bi necamêrî li nêzîk bajarokê Dukanê ji aliyê dest û peywendiyên rejîma Îranê ve hate şehîdkirin, roja min ya herî nexweş bû**

Navbirî pileyên xwe ên siyasî û leşkirî di nava PDKÎ de weha dibire; di despêka pêşmergatiya xwe de diçe komîte şaristana Kirmaşanê û di demsala Payîza sala 1363'an de diçe dewreya despêkî a kadriyê û dibe kadrê siyasî ya likê li komîte şaristana Kirmaşanê. Di Payîza sala 1364'an de, weke berpirsê beşa malî ya komîtê û di Buhara sala 1366'an de, weke kadrê teşkîlatî yê komîtê hat hilbijartin û herweha sala 1367'an de jî dibe endamê komîte şaristana kirmaşanê ser bi melbenda yek. Di Buhara sala 1368'ê de, weke berpirsê komîte şaristana kirmaşanê û hevdem weke endamê melbenda yek a Kurdistanê tê hilbijartin.

Sala 1369'an weke berpirsê malî ê melbenda yek tê hilbijartin û, paşan di sala 1369'an de dibe berpirsê malî ê melbendê û sala 1371'an, cardin dibe berpirsê komîte şaristana Kirmaşanê. Sala 1373'an diçe aliyê deftera siyasî û li fêrgeya siyasî nizamî weke mamosta wanê dibêje û di sala 1385'ê de dibe berpirsê fêrgê. Paşan di sala 1387'ê de diçe komisyona siyasî_nizamî û heya niha li vir erkê xwe ya pêşmergatiyê birêve dibe.

Mamosta Hemdî derheq jiyana xwe ya hevpar weha dibêje; “Sala 1367'an li Qisllanê, min û Wehab Berwezan û Seyfullah Ebdî bi hevre û di rojekê de jiyana hevbeş pêk anî. Xala balkêş eve ku her sê bûk pêşmergên partiyê û xelkê gundekê bûn. Bi vî awayî min di gel Fatime qadirî jiya hevpar pêk anî û berhema jiyana me jî du kur û keçek in.

Mamosta Hemdî roja herî xweş a jiyana xwe weha bas dike; “Rojên davî yên sala 1366'an bû, em nêzîk bi 900 kes ji kadr û pêşmergên PDKÎ li derdora Helebçê ketibûn dorpêça hêzên Komara Îslamî û navbera şerê Îran û Îraqê de, tu hêviyên derbazbûnê ji hêza pêşmerge re nemabû. Şeva davî xeber bi mere anîn ku bi hewl û tekoşînên Dr. Qasimlo û dilsozên PDKÎ, riya rizgarî ji dorpêçê hatiye peydakirin. Em birê ketin û piştî 17 demjimêr rêçûnê, me karî ku di bin agirê şerê du dewletan rizgar bin.

Eva ku cihê dilxweşiyê bû ev bû ku, dema em gehiştin bajarê Seyîd Sadiq, me dît ku Dr. Qasimlo hatibû pêşwaziya me. Rêberê şehîd ji me re got ku; Îro cejna me du cejne, cejna netewî ya Newrozê û cejna rizgarbûnê. Piştî çend rojan birsîtî û mandî bûnê, dema me rastî û dirustiya axavtina Dr. Qasimlo dît, êş û elem û mandîtî di cesteyê me de nema.

Navbirî herweha roja herî nexweş ya jiyana xwe weha tîne ziman; di meha Pûşpera sala 1368'an de; em li menteqê û li dewera Jawero ya Merîwanê bûn. Em roja cejna Qurbanê mêhwanê xelkê gundê Serrêzê bûn. Em di nava baxên gund de bûn, lê tu kes nehat bal me. Cihê pirsyarê bû ku gelo eva çi mêhvaniyeke!? Em gellek çavnihêrî man û tu kes neht. Demjimêr 12 û nîvê nîvro me RDKÎ girt û mixabin nûçeya şehîd ketina Dr. Qasimlo belav kir û em pir nerihet bûn. Ez vê rojê tu caran ji bîr nakim.

Herweha rojek din ku tu caran nahê ji bîrkirin, roja şehîdkirina şehîd Mensûr Fetahî ye, ku gellek bi necamêrî li nêzîk bajarokê Dukanê ji aliyê dest û peywendiyên Komara Îslamî ve hate şehîdkirin.

Mamosta Hemdiyê xebatkar dibêje; “Di Havîna sala 1363'an de, di şerekê de li gundê Palinganê bi saçimeya “RPJ” û herweha di sala 1365'an de jî, li Çemê Gaweroyê em ketin nava kemîna hêzên Komara Îslamî de û ez hatim birîndar kirin.

Kak Hemdî Husên weke gotina xwe ya dawî rû li xelkê Kurdistanê dike û dibêje; “Daxwazê ji xelkê Kurdistanê dikim ku, her weke berê piştevan û xwedî derkevin ji partiya xwe, jiber ku PDKÎ rêberê rasteqîne yê bizava rizgarîxwaziya gelê me ye, eva jî bi tenê bi gotin nabe, belkî PDKÎ di qada xebatê de bi kiryar ev rastî selimandiye. Pêşmerge xortên wan in û bi her awayekê ku dikarin piştevaniyê ji hêza peşmerge bikin.

Herweha daxwazê ji ciwanên kurd dikim ku, her wek ku heya niha li ser xebata xwe a rizgarîxwazî berdewam in û hertim giraniya xebatê li ser milê wan bûye, di her çeperekê de ku dikarin peşmerge bin û bêşmerge bimînin.

www.arsivakurd.org

# Şaristana Kamyaran



Mecîd Cinîkanlû



Şaristana Kamyaranê yek ji Şaristanên parêzgeha Sinê ye ku dikeve başurê rojavayê Îranê. Kamyaran di 65 kîlometriya bajarê Sinê de hilketiye, û pêka serjimêriya sala 1385'an a Rojî , nifûsa wê şaristanê 105.895 hezar kes bûye. Şaristana Kamyaranê xwediyê 191 gundan e.

Şaristana Kamyaranê ji çar herêmên sereke ên wek: Bêlewar, Jawero û Şaho pêk tê, û xwediyê du bajarên Kamyaran û Muçiş e. Navenda sereke ya Şaristanê bajarê Kamyaranê ye.

Hemû kultur û edetên xelkê herêmê wek piraniya akinciyên parêzgeha sinê ye. Xelkê herêmê hemû Kurd û bi zaravê Soranî a Erdelanî dipeyvin. Şaristana Kamyaranê di werzên Buhar û Payîzê de xwediyê av û seqayekî gelek xweşik û rinde. Kamyaran seba vê yekê ku dikeve başûrê parêzgeha Sinê di nava zincîre çiyayên bilind de hatiye dorpêçkirin, û derdora herêmê bi çiyayên wek Şaho hatiye xemilandin ku seba bilindiya çiyayên herêmê ên wek Şaho xwezayekî taybetî di herêmê de heye ku mirov dikare ji bo demên geryanê mifahê jê bistîne.

Zincîre çiyayên Zagros ji çiyayê Bêsitûn a Kirmanşanê dest pê dike û heya deşta pan û bi bereket a Kamyaranê dirêj dibe. Seba cînaretiya Kamyaran û Kirmanşanê û hebûna zaf bingehên wekhev, di herêmê de gelek Kurdên Kelhor jî akincî ne.

Di herêmê de gellek cihên taybetî ji bo geşt û geryanê hene ku ji wan gundê dîrokî yê Palinganê di hemû Îran û Kurdistanê de xwedî nav û deng e. Herwusa gellek cihên din yên torîstî ji bo geryanê hene wek: Bendava Gavşan, Kaniya Bayspirne, Daryam, Kêla dîrokî a Tengerû, Kopikê Tûbire Rîz, Mezarê Hezretê Ekaşe, Hewraman û gelek cihên din.

Di derheq dîroka şaristanê de, li çavkaniyên dîrokî gelek tişt hatine nivîsandin. Pêka çavkaniyên dîrokî Kamyaran her di despêka hebûna mirov di herêmê de cih û warê Kurdan bûye. Li çavkaniyên dîrokî de bas ji qewemekî bi navê Kardo tê kirin ku di vê herêmê de akincî bûne û xwediyê çandekî gellek zengîn bûne.

Tê zanîn ku berê di salên 1340'an a Rojî de, Kamyaran gundekî 300 malbatî bûye ku di nava bax û baxçeyan de hatibû dorpêçkirin. Malên gund di nava gund û li cihekê bi navê "Nav Qela" ku îro rojê jî her maye hatibûn çêkirin. Niha jî li nav bajêr de bi vê herêmê Kamyarana kevin tê gotin. Li nava bajê de hin cihên din hene ku dibêjin cihê Cihûyan bûne ku piştî sehildana gelên Îranê ya li sala 1357'an a Rojî û bi deshilat gehiştina melayan û zext û givaşa wan ji bo wan Kurdên Cihû, bi neçarî Kurdistan bi cih hêştine û ber bi Îsraîlê ve çûne.Piştî sala 1360'î û çêkirina cadeya Sine -Hemedanê Kamyaran wek bajarekî nêz bi rêya hat û çûyînê bû xwediyê girîngiyek zaf û hêdî hêdî ber bi pêşve çû. Bi pêşkevtina bajêr û her wusa hatina xelkê din ê herêmê ji bo Kamyaranê bajar hêdî hêdî mezin bû.

Di destpêka serhildana gelên Îranê bajarê Kamyaranê bi tundî kete ber êrîşa hêzên rejîma Îranê û gelk ji xelkê herêmê seba berevanî ji xwestekên xwe ên dêmokratîk hatin kuştin. Di herêmê de PDKÎ û Komelê xebat dikirin û gellek ji xortên wan herêman di nava wan du partiyn siyasi û di hember êrîşa hêzên rejîmê de canê xwe goriyê rêbaza gelê xwe kirin. Şehîd Şapûr Fîrozî ku yek ji endamên rêberiya partiya demokrat a Kurdistana Îranê bû, xelkê herêma Kamyaranê bû ku li hember êrîşa Komara Îslamî ya Îranê de bi mêrxasî şer kir, û canê xwe goriyê rêbza neteweya xwe kir.

Komara Îslamiya Îranê ji xortên Kamyaranî gellek ditirse û wan wek gefek mezin ji bo hebûna xwe dihesibîne. Mamostayê Şehîd, Ferzad Kemangerê ku di sala 1389'ê de hate darvekirin xelkê bajarê Kamyaranê bû, ku di nava zîndanên rejîma Îranê de bi awayekî netirsana berevanî ji xwestikên Kurdan li rojhilatê Kurdistanê dikir ku di encam de, ji aliyê rejîma Îranê ve hat darvekirin. Bê goman Kamyaran dê gelek Şapûr û Ferzadên din bide dayîka welat.

Doma gotara "ji kê hikimkirinê ve" ber bi ...

Her wuha mafên hemwelatîbûnê, di civakên modern û demokratîk de, beşdarî bi awayeke wekhev di hikûmet û desthiladariyê de ye. Li gor pênaseya civakên modern û demokratîk, welatî xwedî mafên civakî, siyasî û medenî ne.

Azadiya bîr û baweriyê û wekhevî li gorî destûra bingehîn ji mafên medenî yên welatiyan e, û li gor wê yasayê welatî dikarin li her devera ku dixwezin bijîn.

Welatî di civakên siyasî yên modern de, li gor mafên hemwelatiyên civakî dikarin ji hemî derfetên tendirustî, parastina sosyal (di demên bêkar de) û heqdesteke diyarkirî xwedîpar bin.

Mafên siyasî yên hemwelatîbûnê, beşdarî di hilbijartinan de, û her wuha dengnedan û baykotkirin e.

Li gor normên civakên siyasî yên modern û mafên welatiyan li welatên demokratîk de, Rojhilata Navîn di çi astekê de ye?

Li Tûnisê welatiyekî ji ber xirabiya rewşa aboriya xwe û newekhevbûna mercên jiyana civakî-siyasî agir li bedena xwe berda, û şoreşê di vî welatî de dest pêkir.

Li Mîsirê ciwanek bi destê polîs, di bin şikenceyê de hate kuştin. Jiber ku têkiliyê polîs û bandên madeyên hişber dabû eşkere kirin. Bûyera kuştina wî ciwanî, bi wateya nebûna mafê wekheviya hemwelatiyan bû.

Ji aliyeke din ve, kêm neteweyên ku di bin desthilatdariyên dîktatoriyê de, têne bêparkirin jî, mînakeke din ya nebûna mafên siyasî yên welatiyan di civakên navçeyê de ye. Desthilatdariya Suniya li ser Şîîyan û komkujiyênKurdan,li Îraqa berî 2003'an, mînakeke din ya civakên siyasî yên diktator û nemodern e. Li Sûriyeya îroyîn de, du sal ji serhildana welatiyên nerazî derbaz bûye û hîn jî desthilatdar razî nînin ku guh li daxwazên wan bigrin. Daxwazên rewa yên welatiyan, bi komkujî û serkûtê berdewam e.

Rola welatên weke Îran û Erebistanê ku bi leyîzên li ser kêşeyên olî yên di navçeyê de, dixwezin rê li ber ketina pêlên demokratîzasiyonê di welatên xwe de bigrin jî girîng e. Lê bi kêfxweşî û bxteweriyê ve, guhartin li ber derî ye û civak û welatiyên navçeyê ber bi civakên modern û mercên wekhev ve dimeşin. Lê metoda desthilatdariyên diktator li hember daxwazên welatiyên xwe de,



serkût û komkujî ye. Di dawiyê de, dibe ku navçe heta demeke nediyar bibe meydana pevçûna hêzên serekî, lê ya bingehîn daxwaza gelan ya bi nasnamebûn, mafê hemwelatîbûn û jiyan di civakên siyasî yên modern de ye. Ew yek jî bi cinayet û kuştinan ve ji holê nayê rakirin.

Jiberku bingeha fikrî û ramanî ya demokrasiyê, li ser wekhevbûna mirovan e, û ji bingeha fikrî û ramanî ya dîktatoriyê, gelek bihêztir e. Her wuha di civakên navnetewî de, bi awayeke berfireh piştîvanî li wê daxwazê, tê kirin.

www.arsivakurd.org

# Bingehê nasnameya kurdan zimanê wan e

Gelek milet hene wek Sirb, Kirwat û Bosnayiyan ku bingehê nasnameya wan olî ye, tevî ku zimanê wan yek e jî, lê jiber ku mezhebê wan cuda ye, ew bûne sê miletên cuda. Hinek milet jî hene ku nasnameya wan di nav dîrokê de çêbûye, dîrok bingehê nasnameya wan e.

Bingehê nasnameya kurdan zimanê wan e. Di nav kurdan de, êzidî, kakeyî, sunnî, şîî û elewî jî hene. Lê xala hevbeş ya di navbera wan de, zimanê kurdî ye, loma hemî wek kurd tên nas kirin.

Zimanê kurdî mîna piraniya zimanên ku li ser devereke erdnîgarî ya berfireh hatiye belav kirin, ji gelek zaraveyan pêk tê. Du zaravên serekî hene, kurmanciya jorîn û ya jêrîn li gel zazakî, dimilkî û yên din. Bêtiriya zimanên cîhanê ji gelek zaravan pêk tên, wek mînak zimanê çînî ku ji her çar mirovan li cîhanê yek çînî ye, ji diyalektên cuda pêk tê. Li Ewropayê jî wiha ye, li Îtalyayê ku zaravê bajarê florence wek zaravê serekî tê hesibandin, her navçeyê bi zaravê xwe dinivîsîne û dipeyive û ev yek nayê wateya ku Îtalî ne netewek in. Zimanê Erebî jî ji gelek zaravan pêk tê. Li Fransa jî heta sedsala 16-ê, Fransiyan bakûr û başûr hebûn û heta şerê cîhanê yê yekem jî domand. Loma pirbûna zaravan ne kêmasî ye, lê dibe ku nîşana dewlemendiya ziman bi xwe ye.

Ziman di nava sedsalan de, peyde dibe û di nav çend nesl û nifşekî de winda dibe. Wek mînak, li vê navçeyê zimanê aramî hebû, ku nêzî 600 salan zimanê siyaset û dîpolamsiyê bû li vê navçê, herwiha zimanê hezretê Îsa yê axaftinê bû, lê niha bi tenê li hinek gundên Kurdistanê û Sûriyê tê bikaranîn. Zimanê kurdî jî jiber bê dewletbûna kurdan, di sedsala bîstan de, li jêr metirsiya windabûnê ye. Nemaze li Tirkiyê zimanê kurdî ji 90 salan û vir de li jêr xetera asmîlasyonê de ye. .

Dema Enstîtuya Kurdî li Parîsê hat damezrandin, yek ji erkên wê yên serekî parastin û vejandina zimanê kurdî bû. Cara yekem li sala 1983-ê, me hemî zimanzan û





Kendal Nezan

nivîskarên kurd ên Ewropayê yên ji hemî parçeyên Kurdistanê di nav wan de Brahîm Ehmed, Dr. Kemal Fûad û Ferhad Şakelî û kurdên Îran, Bakêr û Sûriyê civiyan derbarê zimanê kurdî. Piştî çend rojan, em gihîştin wê baweriyê ko pêwîstiya zaravê kurmanciya xwarê yan soranî li Başûrê Kurdistanê bi karkirina li ser ziman tune û pirsgirêkên ku hene dikarin di çarçova karê "Korî Zanyarî Kurd" de bên çareser kirin. Man herdu zaravên din, kurmancî û zazakî.

Meseleya ger zaravê soranî bibe zimanê kurdî yê standard, xewnek e. Lewra ku ne mumkin e kurdên dinyayê bi tevahî fêrî soranî bibin û wê bi kar bînin û dewleteke kurdan ya yekbûyî tune ko xelk di xwendingehan de hînî wê zaravê bibin. Loma me baş dît, kurmanciyê bipêş bixin û ragihandin û medya bi vî zaravî rêkûpêktir bikin. Ev di heman demê de, parastina dewlemendiya zimanê kurdî ye û divê hemî zarav bên parastin û bigihînin nifşên nû.

Li ser vê bingehê, enstîtuyê biryar da salane du caran nivîskar û zimanzanên kurd bicivîne û di pêşî de pirsgirêka rêzimana kurdî bê zelalkirin, pirsgirêka rastnivîsa zimanê kurdî çareser bike û parastina gencîneya edeba klasîk a kurdî û gihandina berhemên wêjevanên klasîk ên wek Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û Feqiyê Teyran bo nifşên nû. Herwiha parastina gencîneya folklorê kurdî yê resen û peyvên rojane yên kevin û parastina devokên kurdî, herwiha karkirina li ser termînolojiyên nû yên ku derbasî nav zimanê kurdî dibin. Heta niha 66 kes beşdarî van civînan bûne, 34 ji wan ji Kurdistana Bakûr, 19 ji Kurdistana Başûr, 3 ji Kurdistana Rojhilat, 4 ji Kurdistana Sûriyê, 3 Kurdên Sovyetê û 3 zimanzanên biyanî bûne. Van zimanzanan bi nêzîka 10 zimanan dizanîbûn, loma van gengeşeyan sûdeke mezin dan pirsa me ya ziman.

Di çarçoveya enstîtuyê de du komisyonên me yên ziman hene, komisyonek li ser zaravê kurmancî kar dike û ya din li ser zaravê zazakî. Nêzîka 38-40 milyon kurd li cîhanê hene û nêzîka ji sedî 66-ê wan bi zaravê kurmancî dipeyvin. Li Kurdistana Bakûr nêzîka 19-20 milyonan hene û derdora 15-16 milyonan bi kurmancî dipeyvin, li Kurdistana Îranê 10-11 milyon kurd hene û nêzîka 4 milyonan bi kurmancî diaxivin, kurdên Sûriyê jî 2–2.5 milyon in û bi kurmancî daxivin, herwiha kurdên diaspora û derve wek kurdên Asya Navîn û Ermenistan, Lubnan û Yekîtiya Sovyêtê ya berê jî bi kurmancî daxivin.

Îro, nêzîka 2 milyon kurdan bi zazakî dipeyivin yanî ji sedî 5-ê kurdan, soranî jî nêzîka 10 milyonan pê dipeyvin li Îran û Îraqê angu ji sedî 25-ê kurdan. Loma kurmancî zaraveke pir giring e û divê bê parastin. Civîna me ya yekem li Katalonya ya Spanyayê bû û di 18-ê Nîsan a 1987-ê de bi hevkariya hikûmeta katalonya hat li dar xistin. Di civînê de cara yekem nexşeya Kurdistanê bi navên kurdî hat amade kirin û belav kirin, du caran em li Brûkselê civiyan û du caran li Denmarka û du caran em bûn mêvanên Hikûmeta Herêma Kurdistanê li Duhokê, herwiha civînên me yên din li Parîs û Swêdê çê dibin.

Em encamên her civînekê di rengê belavokeke taybet de didin weşandin û li ser medya kûrdî tê dabeşkirin. Îro rojnamegeriya kurdî ya kurmancî li Sûriyê û bakur van termînolijiyan bikar tînin, me di dirêjiya xebata xwe de kurmancî kir modeke nû û nivîsandina bi kurmancî akteul kir. Me hemî jimarên belavoka "Kurmancî" wek kitêb çap kir ko ji gelelk beşan û ji 1120 rûpelan pêk tê.

Ev kitêb li Stenbolê derket. Ev xebata zêdeyê 20 salan e û em dixin jêr xizmeta zimanê kurdî bi mebesta hevgirtina ziman. Helbet, armanca me ne ew e ku kurmancî bibe zimanê kurdî yê standard, lê bi dîtina me divê hemî zaravên zimanê kurdî bên parastin û dewlemend kirin.

## Kaniya helbestan



Necatê Zivingî

*Ji dema di tarîtiya şeveke ji şevan*

*Meha Berfanbar roja bîst û heştan*

*Bi êrîşên jetan*

*34 xort û ciwan*

*Hatine kuştin bi bombebaran…*

*Ji wê rojê ve…*

*Roboskî mala nû ye,*

*Roboskî xana nû ye,*

*Dîwana nû ye…*

*Ax û fixana nû ye…*

*Mezlûm li wir dicivin êdî…*

*Çiyayên Agirî, Sîpan, Zagros,*

*Cudî, Şerefdîn û Toros…*

*Dora Roboskî dipêçin…*

*Lewra Roboskî nîşana bindestî*

*Û kelha berxwedanê ye…*

*Kurmanc, Baban û Behdînan*

*Botan, Erdelan û Soran*

*Tevlî Dimilî û Goran…*

*Êl û ‘eşîr,*

*Rêber û mîr,*

*Tev kal û pîr…*

*Dîrok li Roboskî dicive…*

*Dişêwire…*

*Dinale…*

www.welatekurdi.org


Agirî

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com / kurdi
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE
E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com



## Dewrêşê Evdî di nav Kurdan de piir tê hezkirin




**Dewrêşê Evdî çîrokeke Kurdan a netewî ya Evîndarî û lehengiyê ye. Destana Dewrêşê Evdî, ne demeke pir kevn e. Lê mixabin ji ber derfetê nivîsandina Kurdan tunebûye, ew jî ketiye bin xetera ji bîrkirinê.** Mîna kurteçîrok û stran ma ye. Li gor tê gotin 32 şaxê Destana Dewrêşê Evdî hene. Di virda ji alî wêjeya Kurdî bi qasî bê şans bûyinê, balkeşî û dewlemedîyek jî heye.

Di Edebiyata Kurdan da cureyek huner heye ku di nava Edebiyata gelên dinê da kêm tê dîtin. Ev jî her çiqas Kurdan nikarîbûne serpêhatiyê xwe binivîsandana jî, li şûna vê ji xwe re babetekî Wêje bi taybet afirandine. Ev jî belklû hêşta nav lê nehatiye kirin. Mirov dikare ji vê re Helbest-çîrok bibêje. Kurdan serpêhatî, bûyer, qehremanî û kul û kederên xwe weke Helbest-çîrokan anîne zimên. Ango him bi klam-stran him jî di nav da bi awayê çîrok gotine. Wek; Şahmahran, Rustemê Zal, Mem û Zîn, Siyabend û Xecê, Dewrêşê Evdî, Tahir û Zahrê, Filîtê Quto, Evdalê Zeynê, Zembîlfiroş, Çetelê Axê, Emê Gozê, Mala Nêsir, Şex Seîdê kal û hwd. Dikare bê gotin ku gelên cîhanê, ji bona kêf û şahiyên xwe stran gotinê. Lê Kurdan êş, derd û fermanên ku bi serê wan da hatine kirine stran.

Li ser Dewrêşê Evdî û Edûlê li her aliyên Kurdîstanê stran bi awayên curbicurhatine tên gotin.

Ev bi xwe jî tê wateya ku ev Destanek bi nirx û netewî ye. Ji wan strana yek jî dengbêjê deng zengil û deng zêrîn, û gorbihişt Qerapêtê Xaço ye.

**Çavkanî: Avesta Kurd**

## Dikomênta " Koçerên Xurasana Bakûr" bû sedema nerazîbûna Kurdên Xurasanê



**Dikomênta Radyoyî a "Koçerên Xorasana Bakûr" ku heyamê mehek berî niha hatibû amade kirin, li gel narazîbûna Kurdên vê herêmê rû bi rû bû.**


Li gor rapora Ajansa Kurdpa, Dikomênta han ji aliyê radyoya Etrek a vê parêzgehê, hatiye amade kirin û bas ji çawaniya Koçkirina koçberên Kurd ên Xurasana bakûr dike û jiyana wan koçberan nîşan dide.

Çavkaniyek bawer pêkirî bi nûçegihanê Kurdpayê' ragehand: Li detpêkê de biryar ew bû ku berhema han bi du zimanê Kurdî û Farisî bihê çêkirin, lê ji aliyê berpirsên navenda Deng û Reng a parêzgeha Xurasana Bakûr dijberiya karê han hate kirin û di encam de tenê bi zimanê Farisî hate amadekirin. Ev karê nawenda Deng û Reng a Etrek bo sebebê nerazîbûna Kurdên herêmê.

Kanla Etrek ku kanaleke ser bi dewleta Îranê ye, çi giringiyekê bi zimanê Kurdî nade û bi awayekê ku di heftiyê de tenê 20 deqe bi zimanê Kurdî bername heye, û ew yek di demekê de ye ku pitir ji yek milyon Kurd li parêzgha Xurasana Bakûr de jiyanê dikin.

Tv'ya Xurasna Rezewî bi zimanê Kurdî bernameyan bilav nake û bi awayek berfireh hewil didin ku Kurdên Kirmanc cûda ji Netewa Kurd bidin nîşandan, û wan asîmîle bikin.

## Parlementerê Amedê Şerafedeîn Elçî jiyana xwe ji dest da



**Parlementerê Amedê û Serokê Giştî yê KADEP'ê Şerafedeîn Elçî jiyana xwe ji dest da.**

Elçî demeke dirêj bû ku di destê nexweşiya şêrpenceyê de dinaland.

Siyasetmedarê Kurd Şerafedîn Elçî, di sala 1938'an de li Cizîrê hate dinê. Elçî, beşa Hiqûqê li Zanîngeha Enqereyê de bidawî anîbû. Heta demekê li Amedê parêzerî kir.

Di sala 1977'an de cara ewil li Mêrdînê wek parlementer hatibû hilbijartin.

Di salên 1978 û 1979'an de li Wezareta Avadaniyê de jî kar kiribû. Di dema derbeya leşkerî ya 12'ê Îlonê de hate girtin. Wî seba vê yekê ku gotibû "Li Tirkiyê de Kurd hene û ez jî Kurd im" hate darizandin û 2 sal û 3 mehan ceza xwar. Elçî di hilbijartinên 12'ê Hezîrana 2011'an de li Amedê wek parlementerê serbixwe hate hilbijartin.

Koça dawiyê ya navbirî bê guman ji bo gelê Kurd li bakûrê Kurdistanê zirarek mezin bû, jiber ku ew kesayetiyekî nîştimanperwer û parlementerekî lêhatî û çalak bû.

Lewra gelê Kurd bi koça dawiyê ya navbirî pirr xembar bûn, û kesayetiyên siyasî, partî û rêkxiraw û nawendên siyasî û medenî ên Kurd bi vê boneyê ve mesajên sersaxiyê ji malbata navbirî re şandin û herwusa li başûrê Kurdstanê de jî du rojan serxweşî jêre hate danîn.

www.arsivakurdi.org